
Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 421 nameronahi@gmail.com 26 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Dewlemendiya Kurdistanê tê talankirin



Dewleta Tirk û rêjîma AKP'ê, dewlemendiya bin erdê ya bajarên Kurdistanê talan dike. Li Kurdistanê ku ji aliyê çavkaniyên bin erdê ve dewlemend e, dewletê karê xwe yê lêgerîna li petrolê zêde kir.

Kurdistan ku di tevahiya dîrokê





de bû navenda mirovahiyê ye, ji ber dewlemendiya xwe ya ser û bin erdê, gelek şaristanî afirand. Li gel madenan, çavkaniyên avê, çandinî û sewalkarî li erdnîgariya Kurdistanê timî li pêş bû. Ji ber vê yekê gelê Kurd û gelên li herêmê bêyî neçarî welatên derve bin, jiyana xwe dewam kirin.

Kurdistan ji aliyê çavkaniyên bin erdê ve jî gelekî dewlemend e. Temamiya petrola li Tirkiyê tê hilberandin, ji Kurdistanê tê derxistin. Li gel dewlemendiya petrolê, Kurdistan ji aliyê madenan ve jî gelekî dewlemend e. Li Kurdistanê rezervên gelekî dewlemend ên hesin, zîv, krom, komir, lînyît û gelek madenên din, hene. Heta niha gelê li herêmê sûd ji van madenên li vir tên derxistin negirtine. Madenên tên derxistin timî li rojavayê Tirkiyê tên bikaranîn. Û bêyî parek ji gelê herêmê re bê dayin, ji derveyî welat re tên firotin.

Temamiya petrola niha li Tirkiyê tê hilberandin, li bajarên Kurdistanê yên weke Êlih, Semsûr, Amed, Şirnex-Silopiya, Sêrt, Riha, Mêrdîn-Nisêbînê tên derxistin. Petrola li Kurdistanê tê derxistin bi rêya lûleyan û wesayitan ji bajarên Tirkiyeyê re tên şandin. Petrola Kurdistanê li parzûngehên Îzmîr-Alîaga, Kocaelî-Îpraş, Kirikkale-Or-





ta Anadolû û Hatay-Dort tên bikaranîn. Padîşahê talanker ê Osmanî Abdulhemîd beriya bi sed salî li Kurdistanê lêgerîneke berfireh a petrolê dabû kirin û herêmên petrolê diyar kiribû. Piştî ku sed sal di ser mirina Abdulhamît re derbas bû, hikumeta AKP'ê wezîfeya Abdulhemîd dewr girtiye. Dewleta Tirk ku sed sal in petrolê li Kurdistanê derdixîne, ji bo dîtin û vekirina bîrên nû, karê xwe zêde kiriye. Hikumeta AKP'ê, salên dawî li sêgoşeya Colemêrg-Wanê dest bi karê lêgerîna li petrolê kiriye. AKP bi taybetî li Colemêrg, Çelê, Şemzînan, Bedlîs û Wanê li cihên ku Abdulhamît diyar kiriye, karê xwe yê lêgerîna li petrolê zêde kir.

Meha Gulanê li navçeya Çelê Hevkariya Anonîm a Petrolên Tirkiyê hate avakirin. Wezîrê berê yê Enerjî û Çavkaniyên Xwezayî yê hikumeta AKP'ê Berat Albayrak diyar kir ku li navçeya Çelê ya Colemêrgê sondajeke kûr hatiye kirin û got, herêm hem ji aliyê potansiyela xwe ve hem jî ji aliyê çavkaniyên bin erdê û petrolê, ciheke ku demeke dirêj e nîqaş li ser tê kirin.

Gelê Kurdistanê ji karê hikumeta AKP'ê yê lêgerîna li petrolê aciz e. Mirovên li herêmê diyar kirin ku petrola li herêmê tê derxistin bi salan e ber bi rojavayê Tirkiyê ve tê şandin û gelê Kurd nikare sûdê jê bigire. Welatiyan dan xuyakirin ku herêmên rojava dewlemend dibin, lê gelê Kurd jî bêhtir xizan dibe. Welatiyan destnîşan kirin ku dewleta Tirk çavkaniyên li Kurdistanê talan dikin û gotin, "Em naxwazin ku dewleta Tirk çavkaniyên me derxîne. Em dixwazin çavkaniyên xwe bi xwe bi kar bînin."...*ANF*

# Sûka Kobanê û apê Nebo





Kobanê çawa ku bi berxwedana xwe bû sembol, di nava xwe de jî gelek sembol hene, çi cih, çi jî kes. Li sûka Kobanê semboleke balkêş heye. Ew jî Apê Neboyê Şêhesen e.

Dema ku mirov bikeve sûka Kobanê û apê Nebo nebîne û şekirê polat li cem wî nexwe, ev tê wê wateyê ku mirov neçûye sûka Kobanê.

Em jî çûn sûka Kobanê û cem apê Nebo. Dema me silav da apê Nebo destê xwe avêt şekirê polatî û da me.

Apê Nebo bi temenê xwe yê 85 salî ku ev bû 60 sal in dikana xwe heye, hin jî çand û pîvanên xwe ye kevin neguhertiye. Ji xwe mirovekî rûken û henekzane. Gelek pêkenokên xwe hene li ser karê xwe. Carekê yek tê gel wî û dibêje 'apê Nebo diranên mehran gel te hene?' Yekser bersiva apê Nebo wiha ye: "Diranê mehrên çend salî dixwazî?" Carekê jî yek dibêje 'apê Nebo ew li gel te heye?' Dîsa bersiva xwe wiha ye: "Çend kîloyan dixwazî?"

Ev mînakan tê wateya ku her tişt li dikana apê Nebo tê dîtin. Dema me li dikana apê Nebo nihêrî helbet em şêst salî paş de vegeriyan. Hemû tiştê xwe kevin e, wek methefekê ye(muzexane). Me ji apê Nebo pirsî, 'çi li dikana te heye? Bersiva wî dîsa di dev de bû: "Ji derziyê heta hêstir li cem min hene."


Neboyê Şêhesen behsa kurê xwe yê Şehîd kir ku di berxwedana Şêx Meqsûd de şehîd bûye: "Her çavên min li wêneyên wî diketin ez digiriyam. Lê vê dawiyê êdî min xwe qanih kir ez jî wekî vî xelkê ku her malekê yek û didu şehîd hene. Ne ew bûna em niha ne li vir bûna û min nikaribû dikana xwe jî vekira."

Apê Nebo dibêje, bi vî temenî xwe ne ku ji bo peran dixebitin, lê pê sebir û wexta xwe derbas dike. Careke din em bibêjin, dema tu sûka Kobanê re derbas bûyî û apê Nebo ziyaret nekî tê wateya ku te sûk nedîtiye...***Heysem Mislim/Kobanê***



Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 421 26 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Hêzên me yekser bersiv dan êrîşan



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku roja 25'ê Tîrmehê saet di 07:30'ê sibê de leşkerên artêşa tirk a dagirker ên li ser xeta sînor sivîl kirine hedef û êrîş kirine. YPG'ê da zanîn ku hêzên wan jî yekser bersiva êrîşan dane û di encama êrîşên artêşa tirk de 2 welatî û şervanek birîndar bûne.***R-2***

# DAIŞ LI DÊRAZORÊ ÊDÎ TUNE DIBE



## ŞERVAN BER BI PÊŞ DE DIÇIN

Pêngava Bagera Cizîrê ya ku ji aliyê QSD'ê ve bi armanca rizgrkirina bejahiya Dêra Zorê ji çeteyên DAIŞ'ê hatiye destpêkirina di qonaxa duyemîn de bi hemû leza xwe didome. Şervanên QSD'ê di nava 24 seatan de li herêmê 35 kîlomtre pêşve çûn. Şervanên QSD'ê li çola rojhilatê Dêra Zorê pêş de diçin. ***R-2***

## ARMANC TÊKBIRINA DAIŞ'Ê YE

Berdevka Fermî ya Pêngava Bagera Cizîrê Lîlwa Ebdulah diyar kir ku hêzên wan di çarçoveya Qonaxa Duyemîn y aPêngavê de heta niha 3 hezar û 100 kîlometreçorgoşe erd ji çeteyan rizgar kirine. Lîlwa wiha got, "Armanca me rizgarkirina herêmên li Rojhilatê Dêrazorê yên ku mane û têkbirina DAIŞ'ê ye." ***R-5***

## Lozanê bedena Kurdistanê parçe kir



Hevseroka Desteya Rêveber a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyê Foza Yusif li ser Peymana Lozanê û encamên wê diyar kir ku vê Peymanê bedena Kurdistanê parçe kir û qirkirina kurdan hat destpê kirin. Foza wiha got, "Ya ku gelan ji van peymanan rizgar bike fikir û sîstema netewa demokratîk e." ***R-3***

## Civaka navnetewî li hember Efrînê bê deng e



Nûnera Meclîsa Sûriya Demokratîk li Washingtonê Sînem Mihemed beşdarî semînerekê bû. Sînem Mihemed di semînerê de axivî û wiha got, "Piştî ku artêşa Tirk a dagirker Efrîn dagir kir niha kiryarên weke kuştin, revandin, talanê didomîne. Lê cîhan weke ku li hember dagirkirinê bê deng man li hember van kiryaran jî bêden e." ***R-5***

## Di êrîşa xwekuj de 50 kes mirin

Çeteyên DAIŞ'ê rêze êrîşên xwekujî li dijî welatiyên bajarê Siweyda yê başûrê Sûriyê ku Durzî ne, pêk anîn. 3 çeteyan xwe di nava welatiyên de li bazara sebzeyan, çerxerêya El-Meşneqa û çerxerêya El-Nicmê teqand. Di encamê de herî kêm 50 welatiyan jiyana xwe ji dest da û 50 welatî jî birîndar bûn. ***R-2***

## Ewropa dişewite, 79 kes mirin

Li gelek welatên Ewropayê dinya gelekî germ e. Li gelek herêman daristan dişewitin. Bi dehan kesan ji ber şewatê ji germa zêde jiyana xwe ji dest dan. Li gorî bîlançoya dawî, li rojhilatê Yunanîstanê û paytext Atînayê, 79 kes ji ber şewata li darisatnan mirin, zêdeyî 160 kes jî birîndar bûn. ***R-2***

## Meclisa Şêwirmendan hate avakirin




Bi dehan zanyarên olî, endamên Saziya Karûbarên Olî ya Dêrazorê, Reqa û Tebqa, endamên saziyên olî yên Bakurê Sûriyê bi civînekê Meclîsa Şêwirmendan avakirin. Berpirsê giştî yê Saziya Olî ya Bakurê Sûriyê Dewran El-Haşimî diyar kir ku avakirina meclîsê ji bo pê: xistina fikrê îslama rast girîng e. ***R-2***

## Ciwanan li Sêmalkayê dest bi çalakiyan kirin



Rêxistinên ciwanan ên Rojava li djiî êrîşên dewleta tirk a dagirker ên li ser Başûrê Kurdistanê li deriyê Sêmalka ji bo mehekê dest bi çalakiyan kirin. Ciwanan di vê derbarê de daxuyaniyek li Sêmalka dan û diyar kirin ku heta ew bighijin armanca xwe ew ê çalakiyên xwe dewam bikin. ***R-5***

## Emê erka xwe ya rizgarkirina Efrînê bi cih bînin



Serokê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê PYDKS'ê Mihyedîn Şêx Alî diyar kir ku ew ê ji bo rizgarkirina Efrînê bi her awayî têkoşîn û berxwedana xwe bidomînin. Şêx Alî bal kişand li ser siyaseta dewleta Tirk a li herêmê jî û got, "Tirkiye naxwaze li Sûriyê aramî pêk were." ***R-4***

# Şervanên QSD'ê li Dêrazorê pêş de diçin

***Pêngava Bagera Cizîrê ya ku ji aliyê QSD'ê ve bi armanca rizgrkirina bejahiya Dêra Zorê ji çeteyên DAIŞ'ê hatiye destpêkirina di qonaxa duyemîn de didome. Şervanên QSD'ê di nava 24 seatan de li herêmê 35 kîlomtre pêşve çûn. Şervanên QSD'ê li çola rojhilatê Dêra Zorê pêş de diçin.***



Pêngava Bagera Cizîrê ya bi armanca paqijkirina çeteyên DAIŞ'ê li Dêra Zorê didome. Şervanên QSD'ê di nava 24 seatan de li herêmê 35 kîlomtre pêşve çûn. Pêngava Bagera Cizîrê ya ku ji aliyê QSD'ê ve bi armanca rizgrkirina bejahiya Dêra Zorê ji çeteyên DAIŞ'ê hatiye destpêkirina di qonaxa duyemîn de didome.
Di çarçoveya qonaxa duyemîn a pêngavê de ku di 4'ê Hezîranê ve destpê kiriye gundewarên başûrê Hesekê bi temamî hate rizgarkirin. Şervanên QSD'ê niha jî li bejahiya (sehra) rojhilatê Dêra Zorê de pêş dikevin.
Di nava 24 saetên dawî de, li herêma newala Rewda şerên giran di navbera çeteyên DAIŞ'ê û çervanên Pêngava Bagera Cizîrê de qewimîn. Şervanan 35 km pêş ve çûn.
Di derbarê pêngavê de şervanê QSD'ê Mihemed El-Abid axivî û wiha got; "Di nava 24 saetên dawî de me dirêjahiya 35 km ber bi bajaroka Baxûz ve rizgar kir. Rexmî germê pêngava berdewam e û heta tinekirina DAIŞ'ê wê bidome."
Li derdora newala Rewda gelek gir hene, çeteyan li hemberî pêşketin şervanên QSD'ê xwe li giran veşartin. Di şerê îro de şervanên QSD'ê çeteyên DAIŞ li newala Rewda têk birin û ew neçarî revê kirin.
Li aliyekê din jî koordîneya di navbera QSD'ê û artêşa Iraqê bi armanca ewlekariya sînor berdewam e. Pêşveçûnên şervanên QSD'ê li bejahiya rojhilatê Dêra Zorê ji 3 aliyan ve berdewam e… *ANHA*

## Gêrîla lê da, 5 leşkerên Tirk hatin kuştin



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku li Colemêrgê di çalakiyên gerîla de herî kêm 5 leşkerên Tirk hatine kuştin.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla yên 23-24'ê Tîrmehê yên li Colemêrgê daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Daxuyanî wiha ye: "Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de li dijî artêşa Tirk a dagirker çalakî li dar xistin.
24'ê Tirîmehê saet 04:30'î, li dijî girê ewlekariya qereqolên Meleyan û Tisê yên li herêma Xumarok a navçeya Şemzînan a Colemêrgê, li dijî leşkerên dijmin çalakiyek hate kirin. Ji pênc baskan ve hêzên me li kozik û stargehên dijmin xistin û di encamê de 3 çeper hatin rûxandin, 2 leşkerên dijmin jî hatin kuştin.
Hêzên me yên YJA Starê heman rojê saet 8'an li dijî leşkerên dijmin ên li ser girê Elîşêr ê li navçeya Gever a Colemêrgê çalakiyek pêk anî. Derbên giran li çeperên dijmin hatin xistin û 3 leşker hatin kuştin."

## Hêzên me yekser bersiv dan êrîşan



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku di encama êrîşên leşkerên artêşa tirk a dagirker de li Serêkaniyê 2 welatî û şervanekî wan birîndar bûne. YPG'ê diyar kir ku şervanên wan bersiveke tund dan leşkerên tirk.
Daxuyaniya Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG wiha ye: "Roja 25'ê Tîrmehê saet di 07:30'ê sibê de leşkerên artêşa tirk a dagirker ên li ser xeta sînor, sivîlên li nêzî malên xwe disekinîn rasterast hedef girtin. Di encama êrîşa leşkerên artêşa tirk a dagirker de 2 sivîlên bi navên Elî Nacî û Mûsa Ubeyd birîndar bûn. Şervanê me yê bi navê Îbrahîm Sarabî ku dixwest kesên birîndar ji qadê xelas bike jî di encama êrîşan de brîndar bû.
Artêşa tirk a dagirker a ku êrîşkarî û tahrîkkariya xwe di hemû şert û mercan de raber dike, rastî bersiveke tund a şervanên me ve hat. Hêzên me yên li ser xeta sînor bi heman awayî êrîşên artêşa dagirker bersivandin."

## Di êrîşa xwekuj de 50 kes mirin




Li herêma Siweyda ya başûrê Sûriyê rêze êrîşên xwekujî pêk hatin û di encamê de bêtirî 50 welatiyan jiyana xwe ji dest da, bêtirî 50 welatiyên din jî birîndar bûn.
Çeteyên DAIŞ'ê rêze êrîşên xwekujî li dijî welatiyên bajarê Siweyda yê başûrê Sûriyê ku ji pêkhateya durzî pêk tê, pêk anîn. 3 çeteyên xwekuj xwe di nava welatiyên bajêr de li bazara sebzeyan, çerxerêya El-Meşneqa û çerxerêya El-Nicmê teqand.
Di encamê de herî kêm 50 welatiyan jiyana xwe ji dest da û 50 welatiyên din jî birîndar bûn.
Di dema êrîşên xwekujiyê de li hin deverên din ên bajêr bombe hatin teqandin. Bi taybet piştî ku hêzên rêjîma Sûriyê li gundewarên bakurê rojhilatê Siweyda êrîşên dijwar li dijî komên çete pêk anîn.
Li gorî agahiyên hatine bidestxistin, çeteyên DAIŞ'ê serweriya xwe li ser gundên Doma, El-Şebkî, El-Şirêhî, Til El-Besîr ên bakurê rojhilatê Siweyda ava kirin û êrîşên xwe bi ser gundên El-Metûnê û Tîma ve birin.
Hêzên rêjîmê û hevkarên xwe serweriya giştî bajarê Siweyda ji bilî aliyekî gundewarên wê dikin. Dezgehên çapemeniyê yên girêdayî rêjîma Sûriyê ragihand ku balafirên şer ên Sûriyê kozikên çeteyan li bakurê rojhilatê bajêr bombebaran kirine û hêzên rêjîmê hewldana çeteyan a êrîşa li dijî gundên Tîma û El-Metûnê şikandin.

## Ewropa dişewite, 79 kes mirin



Li gelek welatên Ewropayê dinya gelekî germ e. Li gelek herêman daristan dişewitin. Li Yunanîstanê bi dehan kes mirin.
Li gorî bîlançoya dawî, li rojhilatê Yunanîstanê û paytext Atînayê, 79 kes ji ber şewata li darisatnan mirin, zêdeyî 160 kes jî birîndar bûn. Şewata li daristanan ji ber bayê belav dibe. Lewma fikar hene ku bîlanço girantir bibe. Gelek welatan pêşniyar li Yunanîstanê kirin ku ji bo destwerdana li êgir bi hewara wan ve biçin.
Li gelek deverên bakurê Ewropayê jî şewat derket. Li Swêdê qadek ji 25 hezar hektarî şewitî. Li gelek deveran şewat hate vemirandin, lê hîn li 20 herêman dewam dike. Rayedaran hişyarî dan û gotin, ji ber dinya gelekî germ e dibe ku rojên bê li gelek deveran şewat derkeve.

## Meclisa Şêwirmendan hate avakirin



Saziyên olî yên herêmên Reqa, Dêrazorê û Tebqayê li mizgefa Ebî Zî El-Xefarî ya gundê Hemar El-Elî ya rojavayê Dêrazorê bi armanca avakirina Meclisa Şêwirmendên li herêmê civînek li dar xist.
Bi dehan zanyarên olî, endamên Saziya Karûbarên Olî ya Dêrazorê, Reqa û Tebqa, endamên saziyên olî yên Bakurê Sûriyê, berpirsê giştî yê Saziya Karûbarên Olî ya Bakurê Sûriyê Dewran El-Haşimî tev li civînê bûn.
Civîn bi xwendina Quranê dest pê kir. Paşê berpirsê giştî yê Saziya Olî ya Bakurê Sûriyê Dewran El-Haşimî rastiya avakirina meclisê û rola wê di fikrên îslama rast de diyar kir. El-Haşimî desntîşan kir ku Meclisa Şêwirmendan wê wek meclisa zagonsaz be ji bo biryarên ku di aliyê olî de têne dayîn wê wekî lêvegereke olî be.
El-Haşimî diyar kir ku meclisê sîstema hundirîn a saziyên karûbarên olî li hemû bajarên herêma Firatê, du zagon ji bo kirêkirina xaniyan, materyalên xwendina zarokan di mizgeftan de di demsala havînê de, her wiha dema lidarxistina nimêjan li her 3 bajaran, danîn.
El-Haşimî diyar kir ku wê peymangeh û dibistanên navîn ên şerîa li herêma Firatê werin aktîfkirin. Her wiha wê kadroyên dersdayînê û materyalên xwendinê werin amadekirin.
Paşê 9 endam ji bo meclisê hatin diyarkirin û Ehmed El-Haronî wek serokê Meclisa Şêwirmendan hate hilbijartin…*ANHA*



# Di pêşengehê de 30 hezar pirtûk hatin pêşandan

***Pêşangeha pirtûkan a duyemîn li Rojava bi pêşengiya Desteya Çand û Hunerê bi dirûşma "Bi xwendinê em ê zindî dibin" li salona Zana ya bajarê Qamişlo ya herêma Cizîrê hate lidarxistin. Di pêşangehê de derdora 30 hezar pirtûkên çandî, wêjeyî, civakî, siyasî û zanistî ku bi zimanên Kurdî, Erebî, Suryanî, Tirkî û Îngilîzî hatine nivîsandin, hatin pêşandan.***



Rewşenbîrên ji gelek herêmên Bakurê Sûriyê diyar kirin ku pêşangeha pirtûkan a Rojava ku salane tê lidarxistin, bandorê li pêşxistina pir-rengiya çandî dike û wê rola wê di pêşxistina nifşên nû de hebe. Pêşangeha îsal hate lidarxistin derdora 30 hezar pirtûkên bi 5 zimanan hatine nivîsandin, pirrengiyê nîşan dide.
Pêşangeha pirtûkan a duyemîn li Rojava bi pêşengiya Desteya Çand û Hunerê bi dirûşma "Bi xwendinê em ê zindî dibin" li salona Zana ya bajarê Qamişlo ya herêma Cizîrê hate lidarxistin.Di pêşangehê de derdora 30 hezar pirtûkên çandî, wêjeyî, civakî, siyasî û zanistî ku bi zimanên kurdî, erebî, suryanî, tirkî û îngilîzî hatine nivîsandin, hatin pêşandan. Di heman pêşangehê de wêneyên şervanên YPG, YPJ, tabloyên navenda jinên rewşenbîr û pêşangeha hêzên Asayîşê jî hatin pêşkêşkirin.
Pêşangeha ku salane di salvegera şehadeta rewşenbîr û kesayeta welatparêz Hisên Şawîş (Herekol) de tê lidarxistin, dê heta roja 25'ê Tîrmehê dewam bike. Şehîd Herekol yek ji kesayetên ku rola wan di pêşxistina materyalên xwendinê yên li Rojava-Bakurê Sûriyeyê hebûye.
Di pêşangeha duyemîn de ku niha tê lidarxistin, pirrengî û dewlemendiya herêmê tê nîşandan.
Rewşenbîr û nivîskarên beşdarî pêşangehê bûne di derbarê pêşengehê de nêrînên xwe anî ziman.

### KOMELEYA SURYANIYAN AMADE BÛ

Endamê Rêveber ê Komeleya Çandî ya Suryaniyan li bajarê Qamişlo û cîgirê Desteya Çand û Hunerê yê Kantona Cizîrê Hena Hena der barê mijarê de axivî û ev tişt anî ziman: "Ev cara duyemîn em beşdarî vê pêşangehê dibin. Em bi 30 pirtûkên ku behsa dîrok û çanda suryaniyan dikin, beşdar bûne. Ev pêşangeh çanda herêmê ya heyî ku bi salane dewam dike, nîşan dide. Dirûşma wê jî tekez baldarî û girîngiya xwendin û nivîsandinê di demên şer de nîşan dide."Hena, di berdewama axaftina xwe de hewldanên Dewleta Osmanî ya tunekirina çanda suryanî bi bîr xist û wiha dom kir: "Zimanê suryanî bi hezaran salan hebûna xwe îspat kir, lê piştî hatina Dewleta Osmanî siyasetên tunekirinê li ser suryaniyan hate meşandin. Di herêmên Tirkiyeyê de zêdetirî 50 navend û dibistanên me hebûn, lê di dema selçûqiyan de tunebûna me hate pêşxistin."

### ÇANDA ME JI NÛVE ZINDÎ BÛ

Hena axaftina xwe wiha domand: "Di van rewşan de derfet ji me re peyda bûn ku em ziman û çanda xwe ji nû ve vejînin û li rex pêkhateyên din çanda xwe di çarçoveya fikra neteweya demokratîk de vejînin. Me peymangeh û navendên çandî bi zimanê xwe vekirin. Ev mijar çanda jiyana hevbeş û aştiyane bi pêkhateyên din re xurt dike. Bi saya wê em ê hêza xwe xurt bikin û bi vê rêbazê zarokên xwe fêrî demokrasiyê bikin."

### PÊŞENGEH NÎŞANEYA PÊŞVEÇÛNÊ YE

Hevserokê Yekitiya Rewşenbîrên Minbicê Ehmed El-Yûsif jî wiha got: "Armanca me geşkirina çandî ye. Ji ber ku gelê xwendina wî tune be ne pêkan e pêşve biçe. Vê pêşangehê rê li pêşiya hevgirtina çandî ya gelan vekir û girêdana di navbera pêkhateyên Sûriyeyê de xurt dike. Li vir çand û fikrên hevbeş tên nasandin û pênasekirin. Serdana welatiyan, xwendekar û rewşenbîran a pêşangehê jî bal kêş e. Beşdarbûna me bi nêzî 100 pirtûkan pêk tê. Em dibînin ku ev pêşangeh nîşana pêşveçûna tecrubeya çandî di Sûriyeyê de ye. Ev mijar ne tenê girêdayî pêkhateyekê ye, lê belê rê li pêşiya hemû pêkhateyan vedibe da ku çandên hev nas bikin."Rêveberê Yekitiya Nivîskarên Kurd di Sûriyê de Dilovan Deştî girêdayî heman mijarê got ku pêşangeh gaveke mezin e û girêdana çandên herêmê û çespandina hebûna wan û zimanên wan piştrast dike. Deştî da zanîn ku êrîşên qirkirinê li dijî zimanê kurdî dihatin meşandin û bi taybet ji aliyê dewleta tirk a dagirker ve û wiha anî ziman: "Me bi israra xwe çand û zimanê xwe vejand û pêşketinên me li Rojava bi vekirina dibistan û zanîngehan nîşana vê yekê ne. Ev pêşangeh gaveke girîng li Rojava ye, nemaze bi rengîniya çandî cîwaz e."…*ANHA*

## Divê huner xwe ji nûve rêxistin bike



Rotînda YETKÎNER

Her çiqasî bi sînorên tûj em nikaribin hunerê beş bi beş cuda bikin jî, lê huner di nava xwe de li gor armanc û daxwazên civak û li gor îdeolojiya afrînêriya xwe gelek cuda ye.
Mînak, muzîka ji bo kêf û serxweşiyê heye û armanca vê muzîkê kefxweşî dayîne, kes nikare bi vê muzîkê jan û êşa mirov jî bîne ziman. Ger yek wusa bêje û bi vê şêwazê stranek bistirîne, wê demê şaşiyek gelek mezin dertê holê.
Muzîk heye tenê ji bo kû êş û jana dilê mirov bête ziman tê hûnandin û ger stran çêkerekê be na, ezê bi vê tarza muzîkê, hestên dil sotîne û rîtmek govendê pêkbînim, ew dem jî arabeska qirêj dertê holê.
Muzîk heye weke pêlên behrê û çemane û êşa veqetinê, jana evînê, bendewariya dildarên dilan tîne ziman û divê stran çêker dema stranekî bihûne, divê vê rastiya xweza ku daye van awazê bi vê rengê, li ber çavan bigre, an na wê şorbeşîrek gemar derkeve holê.
Bi kurtayi ev tarz û stilên di xwezayiya muzîkê de heyî û divê stran çêker, hunermend, stranbêj vê rastiyê tim û dayîm di bîrya xwe de biparêze û ji bîrneke.
Dema me li gor van zagonên muzîkê û bi xwezayîya hunerê huner afirand, bawer bikin wê bandor û xweşikbûna hunerê di asta herî bilind de be.
Niha em rastiya stranên ku di qada şoreşa me de û bi navê şoreşgeriyê tên strandin binêrin, ji wan sedî deh ancax em dikarin bêjin li gor xweza û zagonên muzîkê hatine hûnandin. Stranbêj deh, bist an sih sale di nava şoreşê de ye, an li kêleka şoreşê an jî li qada şer de li pêşe, lê mixabin ji vê rastiya huner û xweza muzîkê gelek dûre.
Sedema vê ya herî mezin siyaseta rojane ku tê meşandin li vêya derî vedike. Sedema duyem, ew kesên kû xwe wek stranbej, heta bi cesaretek mezin navê xwe kiriye hunermend haya wî-wê ji hunerê tune û di nava cahiltiya mezinde hunerê qirêj dike.
Ji bo kû em ji vê qirejî û ne rast hûnandina stranan xilasbin, ji kerema xwe van peşniyaran ji bo civaka paqiş hinek be jî li ber çavanre derbasbikin.

1. Zarokên me ji arabesk û stranên gire girên şer dûr bihêlin.
2. Stranên dewet, govend, listikê nexin nav stranê şoreşgerî û gotinên şoreşgerî bi van stranên govendê nebêjin..Lava rica nekin ji bo xilasiya civakê nekin.
3. Ji bo şehîdan stranên govendê bi helbestên dilsot nebêjin û nedin gotin.
4. Evindariya xwe nekin stranên şoreşger, lê her kes dibe evindar û tu şerma gotina stranên evîndarî nîne…
5. Ger hûn bi hestê Kurdî û bi evîna kurdewar û bi tarzê govenda kurdan dixwazin stran bistêrin, wê demê rîtmê Ereb, Ecem û Romê bikar neynin, lava rica me ev e… Hê gelek tiştên din jî heye bila bimîne carek din silav û rêz.

# Kaniya hunera kurd dengbêjî ye



Hunermendê Kurd Mesûd Gever ku piranî klamên dengbêjiyê distrê, diyar kir kaniya çand û hunera Kurdan dengbêji ye. Gever anî ziman ku muzîk yek ji amûrên sereke yên têkoşînê ye.

Dengbêjên Kurd ên nemir, çand û hunera Kurdan bi awazên xwe yên hestiyar heya roja me anîne. Dengbêjan di heman demê de, hem dîroka Kurdan a nehatî nivîsîn, hem jî wêjeya Kurdan a devkî ji civaka Kurd re vegotine. Gelê Kurd çand û dîroka xwe piranî bi stran, ango awazên dengbêjiyê rave kiriye.
Ev awaz weke çîrokan hatine guhdarîkirin. Di heman demê de wê awazê dîroka Kurdan a ne nivîskî jî hewandiye. Kurdan muzîka xwe bi dengbêjiyê qêriyane û heta roja me ya îro hatiye.
Hunermendê Kurd Mesûd Gever ku piranî klamên dengbêjiyê distrê, çand û hunera Kurd, girîngiya muzîka Kurdî û dengbêjiyê nirxand.

### MUZÎK HERIKÎNA JIYANÊ YE

Gever, dibêje di zaroktiya xwe de ji ber eleqederbûna ferdên malbatê yên ji bo dengbêjiyê re bandor li ser wî kiriye û dest bi karê hunerê kiriye. Gever da zanîn ku li gund dema şahî û dîlan çêdibûn bav û birayên wî tevlî şahiyan dibû û heskirina wî ya ji bo dengbêjiyê jî hîn zêde bû. Gever anî ziman ku bi taybet jî bandora herêmê li ser wî kiriye û wiha axivî: "Muzîk herikîna jiyanê bi xwe ye. Ji bo erdnîgariyê, xweza, gul û sosinan av çawan be, ji bo civakê jî mûzîk heman tişt e. Li cihekî dema ku av tinebe, mirov nikare qala xwezayeke şîn û rengîn bike. Civak û xweza xwe bi rengê muzîkê pênase dike. Muzîk zimanê civakê yê bingehîn e."

### MUZÎK YEK JI AMÛRA TÊKOŞÎNÊ YE

Gever, di çand û hunera Kurdan de rola muzîkê nirxand û wiha pê de çû: "Muzîk ji bo Kurdan amûra sereke ya tekoşînê ye û xweîfadekirin e. Kurd hest, raman û bîrdoziya xwe bi muzîkê rave dikin. Kaniya çand û hunera Kurdan dengbêjî ye. Di dengbêjiya Kurdî de hemû aliyên civakê cihê xwe digire. Kurdan çanda xwe bi dengbêjiyê, bi awayekî zelal raxistiye ber çavan. Dengbêjên Kurd hem dîroka Kurdan a nehatî nivîsîn, hem jî wêjeya Kurdan a devkî ji civaka Kurd re vegotine û dîroka Kurdî zindî hiştine."

### BI AGIRÊ ŞOREŞÊ RE HUNER GEŞ BÛ

Gever bilêv kir ku di saya Têkoşîna Azadiya Gelê Kurd ya 40 salî de muzîka Kurdî zindî bû û ev tişt got: "Bi agirê şoreşê re çand û hunera Kurdan geş bû. Di wê demê de kilam, stran, helbest, şano û folklora Kurdî têr û tijî bû û xebatên dewlemend hatin afirandin. Di vê demê de li gel hemû pêşketina teknolojiyê re jî di muzîka Kurdî de xitimandinek heye. Divê muzîka Kurdî weke salî 90'î pêşengtiyê ji civakê re bike. Divê hunermend vegerin civakê û berê xwe bidin civaka xwe. Hunermend divê berdevkiya gel bike û ji daxwazên gel re bibe bersiv."

### KLAMÊN DENGBÊJIYÊ DISTRÊ

Gever bilêv kir ku piraniya xwe ew kilamên herêma Botan û Serhedê distrê û wiha got: "Yek ji kaniya çand û hunera Kurdan, dengbêjên Kurd yên nemir yên herêma Botan û Serhedê ne. Serhed û Botanê malovaniya wêjeya Kurdî ya ne nivîskî kiriye û heta roja me ya îro ev dewlemendî parastiye. Ez kilamên dengbêjiyê yên Botan û Serhedê distrêm. Hemû aliyên Kurdistanê xwedî dewlemendiyeke mezin ya çandê ne. Dîsan navendên girîng yên dengbêjiyê herêma Amed û Xerzan heye. Dengbêjî ti sînoran nas nake û dewlemendiyek bêdawî ye. Di dil û ruhê dengbêjên Kurd de evîna xaka welat hebû û bi vê evînê klam distrandin."

## Girîngiya şanoyê hate vegotin



Di roja 5'an a Pêşengeha Pirtûkan de, li ser şanoyê semîner hate dayîn, her wiha kurtefîlmeke li ser perwerdeyên Hêzên Asayîşê hate pêşkêşkirin.
Di çalakiyên roja 5'an de, endamên ragihandina ya Hêzên Asayîş û Hêzên Antî- Teror kurtfîlmek li ser perwerdeyê Asayîşê pêşkêş kirin.
Her wiha nivîskar Beşîr Mele Newaf semînerek bi sernavê 'Şano' da.
Di semînerê de nivîskar, girîngiya şanoyê di jiyana gelan de, rola wê di perwerdekirina civakê de destnîşan kir. Mele Beşîr destnîşan kir ku di sedsala 19'an de hunera şano li Rojhilata Navîn pêş bû, lê pergalên desthilatdar û kapîtalîzm tevgerên hunerî û çandî asteng dikirin da ku civakê li paş bihêlin.

# Emê erka rizgarkirina Efrînê bi cih bînin

**Serokê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê PYDKS'ê Mihyedîn Şêx Alî diyar kir ku ew ê ji bo rizgarkirina Efrînê bi her awayî têkoşîn û berxwedana xwe bidomînin. Şêx Alî bal kişand li ser siyaseta dewleta Tirk a li herêmê jî û got, "Tirkiye naxwaze li Sûriyê aramî pêk were."**



**Idrîs HENAN**

Serokê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê PYDKS "Elwehde" Mihyedîn Şêx Alî da zanîn ku berxwedana li Efrînê riya projeyên AKP-MHP xetimand û isbat kir ku Tirkiyê naxwaze aramî li Sûriyê û herêmê pêk were.
Derbarê encam û biryarên Konferansa Rizgarkirina Efrînê de Şêx Alî got: "Hemû şêwayên berxwedan û têkoşînên rewa ji bo me erkin." Her wiha Şêx Alî destnîşan kir ku; çawa YPG, YPJ cihê rêzê ne, Pêşmerge û Gerîlla jî cihê rêzdariyê ne. Tirkiyê di bin navê Qendîlê de



êrişî nasname û destkeftiyên Kurdan dike.
Serokê PYDKS'ê Mihyedîn Şêx Alî bersiva pirsên me da.
1- Li hemberî êrîşên dagirkeriyê gelê Efrînê ku hûn jî yek jê ne, 58 rojan li ber xwe da. hûn 58 rojên berxwedana serdemê û rola partiya xwe têde çawa dinirxînin?
Ji berî ku Tirkiyê di 20.01.2018an de, yekser êrişî Efrînê bike, digel helwest, daxuyanî û çalakiyên alîgirên wê yên ku di çarçovya rikberiya Sûrî de xwedî rol û naskirî ne, di qonaxa amedekirinê de, hemî derfet û îmkanên xwe yên siyasî, dîplomat û ragihandinê bikar anîbûn. Li hêla din, lihevkirin û bingeha hevpeymana AKP-MHP li ser pêkanîna êrişa Efrînê hatibû avakirin. Lewre jî, paşdevekişîn an rawestandina êrişê, têkçûna rêkeftina AKP-MHP bi xwe bû. Vê jî riya projeyên serokomarê Tirkiyê û partiya wî xetimandin.
Xelkê Efrînê li mafê xwe yê xweparastina rewa bê dudilî xwedî derket. Di encamê de 58 rojan bi fedekariyeke dîrokî û bêhempa li ber xwe da. Li seranserî Sûriyê, Rojhilata Navîn û cîhanê deng veda. Rûyê Kurdan li bakurê Sûriyê û diyasporê spî kir. Siyaset û êrîşa Tirkiyê û selefiyên cîhadîst li dijî Efrînê rûreş derxist.
Di vê berxwedanê de, xelkê Efrînê bi dilsozî li hev xwedî derketin û hemî mirovhez, welatparêz, hêzên siyasî, partiya me jî di nav de, bûne yekrêz û xwedî rol. Nemaze di wan meş û xwepêşandanên gelêrî û xwedîderketina li birîndar û Şehîdên YPG-YPJ û hemî berxwedêran de.
Herweha di warên ragihandin û çalakiyên piştgiriyê de, me karîbû di nav xelkê xwe de bimînin û bi erkên xwe rabin.
2- Berxwedana Serdemê çi bandor li ser pêvajoya aloziya Sûriyê û prosesa siyasî li herêmê kir?
Siyaseta Tirkiyê derbarê kirîza Sûriyê bi tevahî û taybet bakurê wê de, cihê gelek guman û metirsiyan bû. Nexasim lidarxistina kongra Antalya, êrişa li Serêkaniyê, Qestel Cindo, Girê Spî, Heleb, Idlib û çiyayên Lazîqiya...
HWD, li vê dawiyê êrişa bejayî û ezmanî ya herî berfireh a bi ser Efrînê de hatî û haziriyên ku jê re hatibûne kirin û herweha rengê berxwedana dîrokî li beramberî hovîtiya hêzên tirk û cîhadîstan, rastiya siyaset û pirojeyên Tirkiyê raberî cîhanê kir. Xuya kir ku, çendî karbidestên Anqerê, Kurdan ji xwe re dijmin dibînin û ka çiqas pirsa aştî, qaşo rûmet û azadiya gelê Sûriyê ji xwe re kirine lîstik û bazar. Her wiha çendî ligel hêzên Islama siyasî - DAIŞ û El-qayde di nav de – hevparin. Çiqas ji diyalog û gotûbêjên peydakirina çareseriyeke siyasî ji aloziya Sûriyê re dilteng in ku naxwazin aramî û aştî li Sûriyê pêk were.
3- Di dîroka têkoşîna gelê kurd de Berxwedana Efrînê ji bo zîndîhiştina doza kurd pêngav û zivrînokeke çawa bû?
Cendî êrişên dagirkirina Tirkiyê ji Efrînê re bûn sedema ziyaneke mezin û birîneke kûr, ewqas jî hezkirin û girêdana xelkê bi nasnameya xwe ya Kurdî Sûrî û zimanê dayîkê re, kûrtir û mezintir bûye û dibe. Lewre, îradeya têkoşîn û berxwedanê li ba gelê Kurd her dê zindî û li dar be.
4- Hûn van itîfaqên li herêmê navbera hêzên navdewletî de, taybet piştî hevdîtina Trump- Pûtîn çawa dixwînin?
Piştî hevdîtina Trump - Potîn li Hilsinkî, dixuye ku pirsgirêkên rewşa Sûriyê bi cînarên derdora wê re, dê bêne dorpêçkirin û sarkirin, û rê li ber rolên Rûsyayê berztir û berfirehtir bibe.
5- Xuyaye ku itîfaqek li ser lawazkirina rola Îranê li herêmê ketiye meriyetê. Gelo wê pêşeroja Tirkiyê di herêmê de piştî Îranê çawa be?
Dûrî xirecirên ragihandinê, pêlên durişim û lêkolînên navendan, hêjaye bê gotin ku, têkiliyên TC ligel Îranê ji bo herdu aliyan cihê girîngiyeke stratecîk û guhdaneke taybet in. Nexasim di warên berjewendiyên aborî-bazirganî û rêzgirtina sînorên fermî de, her dê li cih bin.
6- Wek ku hûn dizanin di navbera 18-21 Hezîranê de Konferansa Rizgarkirina Efrînê li Şehbayê li dar ket. Hûn biryar û encamên konferansê çawa dinirxînin? Gelo hûn weke partî xwe pêbendê van biryaran dibînin?
Çi hevdîtin, civat û konferansek lidarkeve û bêje: Na ji dagirkeriya Tirkiyê, belê ji rizgarkirina Efrînê re, em bi dil û can ligel in. Di vî warî de, hemî şêweyên berxwedan û têkoşînê yên rewa bo me erk û pêdivî ne.
7- Di seferberiya di konferansê de hatiye ragihandin erk, peywir, cih û rola partiya we çi ye?
Di vê qonaxa ku Efrîn têde dijî û derbas dibe de, bêguman bo me, nakokiya sereke û serdefter e. Loma jî, hewildan û çalakiyên partiya me, çi li vir û çi li wir, dikevin warên seferberiya têkoşîna dadmend û berdewam.
8- Piştî Efrînê li Sûriyê pêvajoyên siyasî û leşkerî derbasî qonaxeke nû bûn. Di encamê de paytexta "şoreşa Sûriyê" ya razber hate radestkirin. Gelo ti bandora dagirkirina Efrînê li vê yekê heye? Hûn nexşeya siyasî û leşkerî li Sûriyê piştî van pêşketinan çawa nîgar dikin?
Di tabloya Sûriyê ya hundirîn de, rewş û pêşeroja Efrînê beşek ji dîmenên kirîza Sûriyê û pêvajoyên wê yên têkilhev û diramatîk e. Ev tablo ji bo rewş û pêşeroja herêm û bajarên din jî derbasdar e. Ji xwe, nexşeya siyasî, leşkerî û xaçeriyên çareseriyê, li paytexta Sûriyê şamê têne şirovekirin û naskirin. Mirov dikare bêje ku, yek ji bandorên dagirkirina Tirkiyê û cîhadîstan ji axa Efrînê re, tazîkirina nijadperestî, keysbazî û rûreşiya gelek hêz û kesan bû.
9- Partiya we xwedî mîrateke dirêj a têkoşînê ye. Taybet hûn weke kesayet di civaka kurd de bi helwestên xwe naskirî ne. Gelo hûn di vê qonaxa kirêtîk û hestiyar ku doza gelê kurd tê re derbas dibe de, xwedî erk û peywireke kurdistanî ya bi çi rengî ne?
Di warê Kurdistanî de, hêjaye bête gotin ku ev nêzî 40 salî ye gotûbêj, pêşnyar û hewldan tên kirin ku kongreyekî neteweyî xwedî biryar li dar keve. Nexasim piştî têkçûna şoreşa Îlûnê bi itîfaqa Sedam û Şah ya 6 Adara 1975an re. Îro, roj û rewş cuda ne. derfet û îmkan peyda dibin. Guhertinên mezin çêbûne. Hişyarbûn û astên zanyariyê bilind bûne. Metirsî jî ji berê bêtir in. rêxistin û siyaset li her derê derbasî mala kurdan bûye. Da ku lidarxistina kongreyeke neteweyî û salane ji hemûyan re bibe biryar û hazirî jê re çê bibe, pêdivî berbiçav û kifş e ku civatên Kurdistanî yên şêwrê û berfireh dereng nekevin. Ji bo karekî wiha, partiya me amade ye ku, bi erk û rola xwe rabe.
10- Tirkiyê ji bo têkbirina doza kurd niha başûrê Kurdistanê dagir dike. Nêçîrvan Barzanî jî vê dagirkeriyê rewa dike û Gerilayên Kurd weke dagirker bi nav dike. Hûn vê helwesta Barzanî di vê pêvajoya kirîtîk a doza gelê kurd de çawa pênase dikin?
Destwerdan û êrişên Tirkiyê li dijî xelk û gundewarên Başûrê Kurdistanê, dîrokeke wê ya dûr û dirêj heye. Ev jî di encama çavsorî û diltengiya karbidestên Anqerê derbarê hebûn, nasname û doza gelê Kurd de ye. Ne ji bo Qendîlê û di bin serê Gerîlla de ye. Divê fêm bibe ku, Tirkiye ji berê û paşê de, li serê xwe siwar e. Bi her awayî xwestiye û dixwaze Kurdan bîne hember hev. Nakokiyên wan gur bike. Wan bi hevdu bide kuştin û dijatiyên navxweyî biçîne û kûrtir bike.
Li ba gelê Kurd pêşmerge jî naskirîne, Gerîlla jî naskirîne, ji bo me li Sûriyê, li Kobanî, Cizîr û Efrînê, û li hemî deveran, çendî YPG-YPJ cihê rûmet û rêzgirtinê ne, ewqas jî Pêşmerge û Gerîlla cihê hurmetê ne.
11- Gotin û bangewaziyên we hebin, hûn dikarin bi riya rojnameya me parvebikin?
Bangewazî ew e ku, bê dudilî, bê westan, em her kes di warê xwe de, bi erkên xwe rabin, doza gelê xwe yê dadmend û rewa biparêzin, ji xwîna Şehîdan re wefadar bin. Rê nedin xemsarî, bê hêvîtî û keysbaziyê. Li têkoşîna ji bo aştî, azadî û wekheviyê xwedî derkevin û geş bikin.



## HDP êdî mûxalefeta sereke ye

**Tayîp TEMEL**

Biryardayîn, nîviya serkeftinê ye û diroka gelan jî vê yekê dide nişan. Di şert û mercên nû de HDP'ê jî biryara domandin, kûrkirin û dewlemendkirina têkoşînê da.
Rast e, rewşa Tirkiyê di hin waran de guheriye. Pergala nû xwe li ser qodên desthilatdariya serdest ji nû ve organîze kir. Li gel vê yekê em ê çi bikin? Biryara me çi ye? Ji bo bersivdayîna van pirsan HDP, ji roja piştî hilbijartinê heya niha niqaşên xwe meşandin. Ewil rewş û atmosfera heyî tespît kir. Lê êdî divê bigihîje merheleyek nû. Heya niha di civînên desteyên berpirsiyar de gelek biryarên girîng hatin dayîn. Biryara herî girîng û sereke ew e ku şert û merc çi dibin bila bin, tekoşîn bidome. Bi rê û rêbazên nû, bi biryarbûyenek mezin ev meş dê bigihije serkeftinê. Elbet gelên Tirkiyeyê bi deh salane meşa azadiyê dimeşinin. Em jî bi biryar in ku vê meşê bidomîn.
Aliyekî vê têkoşîna me jî parlamento ye. Di dema nû de fikarên mafdar ên wekî, "çi rola parlamentoyê maye" derdikevin holê. Sazûmanên pergala nû dixwazin parlamentoyê jî bikin bêdera xwe. Ya rast, parlamento her tişt nîne lê ji bo têkoşînê wekî qadek girîng dibinîn. Dixwestin ku HDP di parlamentoyê de cîh negire. Ji bo vê yekî serî li her dek û dolaban dan. Ji ber ku dizanin astengiya li pêşiya serdestiya wan ya herî mezin HDP ye. Her wiha di serdama nû de parlamenterên me bi piranî guherîn, gelek hevalê me nû ne. Lewma civîna me ya Wanê ku me bi koma partiyê re li dar xist girîng bû. Him di civina me de û him jî di vê dema kurt a ku parlamento xebitî de jî derket holê ku parlamento ne qadekî em terkediyarê AKP û hevkarên wan bikin. Her wiha li parlamentoyê girîngî û pêwistiya HDP di çend rojê mesaiya parlamentoyê bi aweyek eşkere diyarbû. Di serdama nû de destkeftiya herî mezin ya gelên Tirkiyeyê, serkeftina HDP'ê û temsiliyeta wî ya meclise ye. HDP êdî muxalefeta sereke, denge gelan û cihê parastina mafên hemû beşên civakê ye. Di civîna Wanê de bi biryarûnek mezin hebû. Her parlementerek dizane ku barê wî/ê girane û li gor vê yekê tevdigere. Daxwaza domandina vê têkoşînê ji bo koma HDP li pêş e. Bi motivasyona vê yeke hewl dide. Li gor vê yekê jî me nexşeriya xwe ya dema nû diyar kir. Hin biryarên sereke derketin holê. Li gor vê yekê:Koma me di vê demê de dê li hemberê pergala zordest muxalefetekî bi bandor bike. Em bi hêza xwe dizanin û ew jî bi hêza me dizanin. Ji me ditirsin. Tenê di hevditina pêşnûmeya dawî de jî derket holê li hemberê îktidar û hevkarên wî tehê HDP muxalefetê dike. Ji ber ku nikarin di warê fikr û raman de bi me re bikevin pêşbaziyê dest bi êrişan dikin. Em xebatên xwe tenê bi parlamentoyê sînordar nakin. Ji îro pê de hemû parlamenterê me dê li qadan bin, bi gel re bin. Armanca me ewe kû em hêza xwe ya parlamentoyê û hêza gel bikin yek. Dem dema tirsê, paşvemayinê û fikaran nîne, niha divê maf û azadiyên ku ji me hatine dizîn em ji nû ve bi dest bixin. Têkoşîn tenê bi xebatên parlamentoyê naçin ser, hêvî û bendewariya me ji gelê me heye û di vê warê de jî dilê rihetin. Dizanin ku gelê me ji bo azadiya xwe di her merheleyê de amede ye. Emê wekî pêvajoya hilbijartinê bi qampanyayê hîn xurtir vê xebata xwe bidomîn in. Ya sêyemin emê her roj, her saet xwe bi rêxistin bikin. Herî hindik divê em bi qasê dijberê xwe bi rêxistin bibin. Hemû xebatê me dê li ser vê esasê bimeşe.



# Em ê DAIŞ'ê bi temamî têk bibin

**Berdevka Fermî ya Pêngava Bagera Cizîrê Lîlwa Ebdulah diyar kir ku hêzên wan di çarçoveya Qonaxa Duyemîn y aPêngavê de heta niha 3 hezar û 100 kîlometreçorgoşe erd ji çeteyan rizgar kirine. Lîlwa wiha got, "Armanca me rizgarkirina herêmên li Rojhilatê Dêrazorê yên ku mane û têkbirina DAIŞ'ê ye."**



Berdevka Fermî ya Pêngava Bagera Cizîrê Lîlwa Ebdulah diyar kir ku hêzên wan di çarçoveya qonaxa duyemîn a Pêngava Bagera Cizîrê de herêmek bi qasî 3 hezar û 100 km2 ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirine û da zanîn ku hevkariya di navbera wan û hêzên Iraqê de bi armanca parastina ewlekariya sînorê Iraq û Sûriyê didome.
Berdevka Fermî ya Pêngava Bagera Cizîrê Lîlwa Ebdulah diyar kir ku armanca Pêngava wan rizgarkirina bajarokên El-Şiefe, Hejîn, Ebû El-Xatir, Ebû El-Hesen û El-Sûsa ye.
Lîlwa El-Ebdulah da zanîn ku hemleya wan didome û destnîşan kir ku armanca hemleyê rizgarkirina herêmên yên rojhilatê Dêrezorê mane û têkbirina çeteyên DAIŞ'ê li herêmê ye.

### 3000 KÎLO METRE ÇARGOŞE HAT RIZGAR KIRIN

LîlwaEbdulah da zanîn ku hêzên wan herêmek zêdetirî 3 hezar km2 ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirine û wiha dewam kir: "Hêzên me herêmek bi qasî 3 hezar û 100 km2 ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirine. Herêmên hatine rizgarkirin ji sê aliyên hemleya me (Mergeda, Şedadê û Holê) pêk hatin. Di wê herêmê de 50 gund û mezre hatin rizgarkirin. Her wiha miqdarek zêde çekên çeteyan hatin desteserkirin."

### BI SEDAN SIVÎL HATIN RIZGA KIRIN

Lîlwa Ebdulah di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku hêzên wan di çarçoveya qonaxa duyemîn a hemleyê di gund û mezreyên rizgarkirî de bi sedan welatiyên sivîl ji çeteyan hatin rizgarkirin û got: "Rizgarkirina welatiyan bi rêya vekirina korîdorên ewle pêk hat. Çeteyên DAIŞ'ê ji bo pêşveçûna şervanên me asteng bikin, welatiyên sivîl wek mertalên zindî bi kar dianîn. Hêzên me wê rê nedin tu aliyan ku ewlekariya herêmên hatine rizgarkirin, binpê bikin."

### HEVKDARIYA ME Û ARTÊŞA IRAQÊ DIDOME

Lîlwa Ebdulah derbarê hevkariya di navbera hêzên wan û artêşa Iraqê de jî ev tişt anî ziman: "Hevkariya di navbera me û artêşa Iraqê de bi hemû hêza xwe didome. Odeyên çalakiyan ên hevbeş li ser sînor hatine çêkirin. Armanc ji wê yekê parastina ewlekariya sînor ji çeteyan e. Ev jî bi piştgiriya ezmanî ya Koalîsyona Navdewletî pêk tê."
Lîlwa derbarê armanca wan a dema pêş jî agahî dan û ev tişt anî ziman: "Piştî rizgarkirina bejahiya Dişîşa bi dawî bibe, wê hêzên me berê xwe bidin herêmên di bin dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê de û bi taybet bajarokê El-Şefa, Hejîn, Ebû El-Xatir, Ebû El-Hesen û El-Sûsa."
Berdevaka Pêngava Bagera Cizîrê Lîlwa Ebdulah di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku wê bihostek ji xaka rizgarkirî radestî tu aliyan nekin û wiha got: "Bila gelê me rehet be, em tu carî xaka bi keda şervanên me û bi xwîna şehîdan a pîroz hatiye rizgarkirin, teslîmî kesî nakin."…*ANHA*

# Ciwanan li Sêmalkayê dest bi çalakiyan kirin




Rêxistinên ciwanan ên Rojava li djiî êrîşên dewleta tirk a dagirker ên li ser Başûrê Kurdistanê û polîtîkeyên PDK'ê ku destur nade ciwan derbasî Başûr bibin û tevlî çalakiyên ciwanên Qendîlê bibin dest bi çalakiyan kirin. Çalakî wê mehekê berdewam bike.
Bi armanca şermezarakirina êrîşên dagirkeriya Tirkiyê yên li ser Başûrê Kurdistanê û siyastên PDK'ê ku rê neda ciwanên Rojava ku derbasî Başûr bibin û piştgiriyê bidin çalakiyên mertalên zindî yên ciwanên Başûr, ji rêxistinên ciwanan ên Rojavayê Kurdistanê nêzî 150 ciwan li deriyê sînor ê Sêmalka daxuyanî dan.
Daxuyanî ji aliyê Koordînatorê Giştî yê Ciwanên Kurd Murad Qamişlo ve hate xwendin.
Di daxuyaniyê de hate gotin, "Wekî berdewama Pêngava 'Serî Hide' em îro li deriyê Sêmlakayê kom bûne, ta derbasî Başûrê Kurdistanê bibin û piştgiriyê bidin ciwanên Başûrê Kurdistanê. Lê PDK'ê dîsa piştgiriya xwe ya bi Tirkiyê re ispat kir.
Pêngava 'Serî Hilde' wê li deriyê Sêmalka di bin konê çalakiyê de berdewam bike ta armanca me ya derbasbûna Başûrê Kurdistanê bighêje serî. PDK'ê divê helwesta xwe ya li hemberî dagirkeriya Tirkiyê re diyar bike û destur bide ciwanan ku piştgiriyê bidin pêngava Mertalên Zindî ya ciwanên Başûrê Kurdistanê li hemberî dagirkeriya Tirkiyê.
Em amade ne tevahî xaka Kurdistanê biparêzin, wekî çawa me parastina Reqa, Dêrazor û herêmên din ên Rojava û Bakurê Sûriyê kir em ê li hember dagirkeriya Tirkiyê jî Başûrê Kurdistanê bi parêzin.
Armanca dewleta Tirk a dagirker ne tenê Qendîl û Başûrê Kurdistanê, lê belê tevahî gelê Kurd e. Em bang li ciwanên Kurdistanê dikin ku hemberî dagirkeriya Tirkiyê bisekinin.

# Civaka navnetewî li hember Efrînê bê deng e

Li navenda Klûba Navnetewî a Çapemeniyê ya Washingtonê semînerek derbarê mezhebên olî yên Efrînê û sîstema demokratîk li Rojava û Bakurê Sûriyê hate organîzekirin. Nûnera Meclîsa Sûriya Demokratîk li Washingtonê Sînem Mihemed beşdarî semînerê bû.
Di çarçoveya rêzecivînên wezaretan de ku bi navê azadiyên olî li Wezareta Karên Derve ya Amerîka tên organîzekirin, semînerek hate organîzekirin. Semîner ji aliyê Sînem Mihemed ve hate birêvebirin. Sînemê di semînerê de axivî û bal kişand ser rewşa Sûriyê.
Sînem Mihemed diyar kir ku QSD'ê gelek herêmên Sûriyê ji destên çeteyan rizgar kirin û sîwana wê ya siyasî jî Meclîsa Sûriya Demokratîk (MSD) ye û wiha got, "MSD hemû pêkhateyên Sûriyê digire nava xwe. Sêyemîn konferansa MSD'ê beriya niha hate lidarxistin û 300 nûnerên hemû pêkhate û herêmên Sûriyê beşdar bûn. Beşdaran piştrast kirin ku pêdiviya wan bi Sûriyeke demokratîk û nenavendî heye da ku hemû pêkhate û mezheb û ol azad bijîn."
Sînemê da zanîn ku demokrasî niha li Bakurê Sûriyê tê meşandin û wiha dewam kir: "Li Bakurê Sûriyê demokrasî pêk tê û hemû pêkhate cihê xwe di sazî û rêveberiyan de digirin. Her wiha rêgeza hevserokatiyê jî di hemû sazî û desteyan de pêk hatiye."
Sînemê diyar kir ku gelek hêzên sermiyadar derketin û şerê vê demokrasiyê dikin û got, "weke ku li Efrînê pêk hatiye û artêşa Tirk a dagirker bi komên çete yên girêdayî xwe herêma Efîrnê dagir kirin. Artêşa Tirk a dagirker bi hemû hovîtiya xwe êrîşî herêma Efrînê kir. Gelê Efrînê tevî hêzên xwe yên parastinê 58 rojan li ber xwe dan. Di encama êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê de herî kêm 300 welatiyên sivîl jiyana xwe ji dest dan. Li hemberî wê komkujiyê civaka navnetewî û giştî cîhan



bêdeng ma û di dawiyê de welatiyên Efrînê neçar man ji Efrînê derkevin û li Şehba bi cih bibin."
Sînem Mihemed wiha dewam kir, "dewleta Tirk a dagirker bi vê yekê bes nema. Leşkerên Tirk û çeteyên girêdayî kiryarên mîna kuştin, talan, wêrankirin û revandina welatiyên sivîl ên Efrînê hê jî didomînin û dîsa jî civaka navnetewî bêdeng e."



## Mirina Demokrasiyê

**Mihemed ŞAHÎN**

Demokrasî gav bi gav ber bi mirinê ve diçe, faşîzm pêl bi pêl bilind dibe.
Di 16 salên dawîn de hikûmeta AKP'ê hemû nirx, rûmet û pîvanên mirovahiyê kirin qurbana berjewendiyên desthilatdariya xwe. Erdogan, kêm demokrasiya mayî û pergala dewletê yê sedan salî jî dike qurbana dîktatoriya xwe.
Di cîhanê de gelek dîktator di pergala demokrasiyê de bi hilbijartinan hatine ser kar û dawî li demokrasiyê anîne. Hemûyan jî bi wada anîna demokrasiyeke pêşketî, bi îdaya avakirina pergaleke adilane, bi îdaya avakirina dewleteke dewlemend û xurt gav bi gav demokrasî ber bi mirinê ve birine û dîktatoriya xwe ava kirine. Weke ku tê zanîn ji vana mînakê herî dijwar Hîtlere. Hîtler meclîsa xwe bi destê xwe dide şewitandin û dike hinceta tasfiyekirina hemû muxalîfan û tekûz kirina pergala dîktaroya xwe ya faşîst.
Niha Erdogan jî di rêya Hîtler de dibeze. Erdogan hewla derbeya 15'ê tîrmeha 2016'yan a ku meclîs bombekir ji xwe re weke "lutfa xweda" bikar anî û du sale hemû muxalîfan ji qirikrina siyasî derbas dike û gav bi gav pergala dîktatoriya xwe ya faşîst ava dike. Hîtler û hemû dîktatorên dinan bi kîjan wadan dîktatoriya xwe bi gel dane qebûlkirin Erdogan jî bi heman wadan li ser kêmasiyên muxalefetê dîktatoriya xwe bi civakên Tirkiyê dide qebûlkirin.
Erdogan jî weke hemû dîktatoran ji civakê re dibêje; "ji bo pêkhatina demokrasiyeke xurt, ji bo pêkhatina pergaleke adilane, ji bo dewlemendbûna civakê û dewletê pêdivî bi guherîna pergalê heye".
Geşedanên piştî hilbijartinê û pêve girêdayî di bin navê rakirina rewşa awarte de mayinde kirina rewşa awarte û diyarbûna kabîleya (kabîne) wezîran a şer gelek zelal nîşanê me didin ku rastî tam berevasjiyê van gotinane. Civak bixapandinke mezin re rû bi rû ye, xema wî ne domokrasiyê, ne edalete û ne dewlemendbûna civak û dewletê ye. Yekane xema Erdogan heye, ew jî pêkanîn û tekûzkirina pergala dîktatoriya xwe û dewlemendkirina qabîleya xwe ye.
Erdoganê ku du sale rewşa awarte (OHAL) ji bo avakirina dîktatoriya xwe weke amûr bikar dianî niha jî dixwaze weke pergaleke asayî bi gel bide qebûlkirin. Hetanî niha di rewşa awarte ya derbasdar de biryarnameyên lijneya wezîran (KHK) hebûn, niha di serdema nû de, di rewşa awarteya assayî û domdar bûyî de de fermanameyên serok dewlet (CBK) hene.
Piştî hişbijartinan li Tirkiyê serdemek bi dawî bû û serdemeke nû dest pê kiriye. Di vî serdema nû de pergala dewletê tune ye, hikûmet tune ye. Yek kes û qabîleya xwe hene. Ev yek kes û qabileya xwe makezagona xwe nas nakin, zagonên xwe nas nakin, pîvan û mafên gerdûnî nasnakin, tenê û tenê ferman û fermanameyên yek kesî yên ku hemû nirx, pîvan û rûmetên mirov û civakê bin pê dikin û mafê jiyanê nadin yên muxalîf û cudayan hene.
Erdoganê ku bi wada xurtkirina demokrasiyê ji gel deng xwestibû piştî hilbijartinê gav bi gav demokrasiyê ber mirinê ve dibe. Bê guman serkeftina xwe jî deyndarê muxalfetê ye.
Ji îro şûnve ya diyarde dê sekna muxalefetê be. An, dê bi vê sekna xwe ya belavbûyî ya ku hetanî ji faşîzma Erdogan û Bahçelî re xizmet kiriye berdewam bikin û li benda roja mirina xwe bin, an jî dê di bin navê eniya muxalîf de hêza xwe bikin yek, dawî li serdema ferrnanameyan (CBK) bînin û ji nav kavilên serdema rûxandide Tirkiye ke demokratîk a nû ava bikin.
Berdewama hebûna Erdogan û ya dîktatoriya wî bi mirina demokrasiyê pêkane, lê berdewama hebûna muxalefetê jî bi hebûna demokrasiyê pêkan e.
Nexwe ji bo berdewama jiyana xwe yekane vebjêrka muxalefetê heye, ew jî berxwedan e. Bi kurt û kurmancî, an berxwedan, an mirin.